# BIZANÎ KU ÇI DERBAS DIBE SERXWEŞÎ Û XETERE



## Li navenda lêhûrbûnê: **Cannabis**

| | |
|---|---|
| Materyal | • Materyala bibandor a sereke ya giyayê Şadaneyê Tetrahydrocannabinol (THC) û berpirsa pêkanîna hesta serxweşiyê ye (di vî warî de qasa THC'yê girêdayî bi cûreya giyayî gelekî guherbar e).<br>• Ji bilî vêya, pêkhatî ji Canabidiol (CBD) e ku bandora xwe ya aramker heye.<br>• Cannabinoide'ya çêkirî hin pêkhateyên nû ji Cannabinoide'ên giyayê û berhemhatî bi awayê çêkirî ne ku dikarin bandora THC'yê bişibihînin. |
| Forma bikaranîn û bandorê | • <u>Forma bikaranînê</u>: pirranî bi awayê Marî Ciwana (kulîk û pelên hişkkirî yên giyayê heşîşê/cannabis'ê) yan jî Heşîş/Haschisch (ji şîrava gula Blütenstände)<br>• Awayê herî nasyar ê bikaranînê, bikaranîna cixareya Marî Ciwanayê (kiffen) ye, di halekî de ku Heşîş an Marî Ciwanaya hêrrandî pirranî digel tembakoyê tê tevlihevkirin û bi awayê cixare tê pêçandin<br>• Herwiha berhemên Heşîşê bi rêya cûreyên pîpan, qelûn û herwiha tîndanê (veyp) tên bikaranîn.<br>• Carinan berhemên heşîşê bi awayê helandî li nav avê tên vexwarin an jî bi awayê şîranî (kulîçeyên Space) tên patin û xwarin.<br>• <u>Bandorên gengaz</u>: Jordabirina moralê, hesta aramî û xweşiyê, geşatî, zêdekirina hewceyîya danîna têkiliyê, gurrkirina têgihîştinên hestî yên bihîstin û dîtinê, xû û mirûza damayî, behicîna derûnî-livbarî, bêhedarî, tirs, bertekên tirs û wehşetê, perîşanî, hizr û xeyalên ketina ber şopandinê, wehmên paranoîdî<br>• Bereya bandorên heşîşê gelekî berfireh e girêdayî bi cûreya bikaranînê, qasa materyala bibandor, rewşa bikaranînê, xû û mirûza giştî û seqamgîriya derûnî ya bikarêneran e. |
| Bikaranîna hevdudanî | • Heşîş bandora elkolê gurrtir dike, lê berovajî na. Di rewşa bikaranîna hevdudanî, bandorên nebaş zêdetir dibin.<br>• Xeter: Nîşaneyên hişyariya leşî nayên têgihîştin. |
| Destebendiya qanûnî | • Ji temenê 18 salî û mezintir: Hilgirtin ji bo bikaranîna kesane heta 25 graman rêpêdayî ye<br>• Hilgirtin li cihê niştecîbûnê: heta 50 gram<br>• Bikaranîna qedexe: li cem zarok ûnûciwanan, li dibistanan, li qadên lîstinê, navendên zarok û xortan, qadên sporê yên gihêjbar ji bo gelemper û herwiha cihên bînbar ên nêzikî van cihan yan di navbira 100 mitrî, li qadên peyarêk saet ji 7 heta 20<br>• Ji bo nûciwanan heşîş bi giştî hema wisa qedexe ye. Di rewşa binpêkirinê de ji sergêrên qanûnî ra tê ragihandin, di hin şert û mercan de kiryarên ronkirin û rawêjkariyê pêwîst dibe.<br>• Di hatûçûna ji kolanê li paş dîreksyonê herî pirr qasa rêpêdayî ya THC'yê bi qasî 3,5 ng/ml THC di seroma xwînê de tê sepandin. Ji bo ajovanên nûhatî di heyama dewreya fêrkirinê heta dawiya 21.<br>• Saliyê qedexeya bikaranînê ya tekûz tê sepandin. Têbînî: Ji ber ku heşîş di leşî de tenê hêdî tê parçekirin, dibe ku di rewşa bikaranîna berdewam de, testa mîzê di dema kontrola hatûçûnê de 'erênî' be, heta heke bikaranîn çend roj berê bûbe. |

PRO Langenhagen Ev belgeya ragihandinê ji aliyê Konsseya Pêşîlêgirtinê ya Langenhagen'ê ve ketiye bin sîvana piştevaniya darayî.

# BIZANÎ KU ÇI DERBAS DIBE SERXWEŞÎ Û XETERE

## Li navenda lêhûrbûnê: **Cannabis**

| | |
|---|---|
| Xetereyên giran û dûhatên dirêjdem | • Xetere ji bo nûciwanan gelekî zehf e, ji ber ku THC dibe ku zirarê bide geşekirina mejî. Lêkolîn dibêjin ku bikaranîna pêşwext û berdewam a heşîşê dibe ku xetereya skîzofêrniyê (Schizophrenie) zêdetir bike û geşekirina kesayetiyê aloz bike. Derbarê nûciwanên ku berdewam heşîşê bi akr tînin, dibe ku xetereya tengijîn û hizrên xwekujiyê di jiyana pêşerojê de zêdetir bibin.<br>• Dûhatên dirêjdem ên gengaz: xebat û funksyona mejî bi zêdebûna heyamê û asta bikaranînê tûşî zirarê dibe, xirabtirbûna funksyonên hînbûn û bîrê, girêdayîbûna derûnî, diyarbûna berdewam a Bronşîtê, sînordariyên kapasîteya pişikan, di rewşa bikaranîna heşîşê digel tembakoyê, xeterên dijî tenduristiyê yên weke heman bikaranîna tembakoyê hene, xetereya krîza dil zêdetir dibe, xetera perûşiya derûnî zêdetir dibe, handêrê skîzofêrniyê ye ku pêştir nihênî bûye |
| Pêşîlêgirtin û şîret | • Qanûnîbûna rêjeyî dibe ku bibe sebeba rûbirûbûna sist digel heşîşê. Helwêsta diyar a kesên jêder û danûstana aşkira û bê lome digel kesên xort û ciwan ji bo pêkhatina helwêsta bihêz a kesane sûdmend in.<br>• www.cannabisprävention.de hin zanyarî û şîretan ji bo kesên jêder raber dike. |
| Estatîstîk | • Planeke lêkolînî ya Ofîsa Federal a Ronkirinê ya têkildarî tenduristiyê (BzgA) ji sala 2023an ve nîşan dide ku wek mînak 91 kes ji 100 nûciwanên navbera 12 heta 17 alî tu wextî heşîş bi kar neanîne (91.7%), 1.3% zêdetir ji 10 caran di heyama 12 heyvên raborî de cixareya Marî Ciwanayê kêşane, 0.4 % bikaranîna kêşesaz hene. Derbarê kesên ji 18 heta 25 salî, sedî 47.2 ezmûna bikaranînê, sedî 8.0 zêdetir ji 10 caran di heyama 12 heyvên raborî de cixareya Marî Ciwanayê kêşane, 3.2% jî bikaranîna kêşesaz hene. |


**Çavkanî**

https://www.niedersachsen.de/cannabis (Destragihîştin: 22.09.2025)
https://www.drugcom.de (Destragihîştin: 22.09.2025)
https://www.cannabispraevention.de/ (Destragihîştin: 22.09.2025)
https://www.bioeg.de/fileadmin/user_upload/PDF/pressemitteilungen/daten_und_fakten/Infoblatt_Drogenaffinit%C3%A4tsstudie_2023_Cannabis.pdf (Destragihîştin: 01.10.25)



PRO Langenhagen
Ev belgeya ragihandinê ji aliyê Konsseya Pêşîlêgirtinê ya Langenhagen'ê ve ketiye bin sîvana piştevaniya darayî.

Landeshauptstadt Hannover | LANGENHAGEN bewegt | STADT LEHRTE | Region Hannover